Kurdî / Kurdisch

HSK

Ders bi zmanê Welat

(Heimatliche Sprache und Kultur HSK)

Agahîyên ji bo malbat û mafdarên perwerdekirinê

Teşwîqa di zmanê almanî û pêşveçûna pirzmanî û jêhatina navçandî ji wesîfên bingehînên dibistanên fermî ne. Pêşveçûna pirzmanî û jêhatina navçandî herweha armancên dersên di zmanê welat daye. (HSK) Ji ber vê sebebê di dibistanên resmî da dersên zmanê welat tê dayîn û ji alîyê berpirsîyarîya perwerdeyî ve tê palpiştkirin.

Pirzmanî û jêhatîna navçandî

Ciwanên, ku zmanê hevbeş almanî baş dizanin û xeynê wî jî, ku bikaribin di zmanê malbatê da bi awayeki herikî biaxifin û xwe baş bidinfêmkirin, ji bo integrebûna di mêhne û di civakê da xwedî pîvanên grîngen.

Dersên HSK li her kantonê heye; li hin bajaran di 25 zmanan zêdetir da ders tê dayîn.

Armanca dersên HSK

Zarok û ciwan

- di zmanê xwe yê yekemîn da jêhatîbûna xwe ya di axaftin û fêmkirinê da, di xwendin û nivîsandinê da kûr û berfireh dikin.
- qebilîyeta xwe ya di warê tevgerîna di nav du an jî zêdetir zman û çandên cuda da berfireh dikin û urf û adetan fêm dikin û hurmeta wan digrin.

Feyda di jîyana mêhne û civatê da

- Kî zmanê xwe yê yekemîn baş bizane, ew temelekî bingehîn ji bo hînbûna zmanên din datîne. (Almanî û zmanên biyanî).
- Baş zanîna zmanê yekemîn alikarîya zarokan dike, ku ew pêwendîyê di nav malbatê da, bi merivan ra û bi welat ra biparêzin.
- Di pêwendîyên bi welat ra baş zanîna zmanê welat girînge.(Ji bo perwerdeyîyên din, ji bo mêhne, ji bo vegera welat).

Malbat piştgirîya pêşveçûna zmanê zaroka xwe dikin

- bi vî awayî, ku ew bi zarokên xwe ra bi wê zmanê, ku ew pê difikirin, xewnê xwe dibînin biaxifin û eger zarok bi wan ra bi almanî biaxife jî, ew zmanê xwe neguhêrin.
- bi vî awayî, ku ew dilgeşîya zaroka xwe ji bo zman şîyar bike û wê biparêze, ji hev ra behsa jîyana rojane bikin û guhdarî bikin, gengeşe bikin, kelam bêjin, çîrokan bêjin û bixwînin.
- bi vî awayî, ku her şehsê di nav malbatê da di pêwendîyên bi zarokan ra her tim bi zmanê xwe biaxife.
- bi vî awayî, ku ew piştbidine zarok, ku ew pêwendî bi zarokên, ku almanî an jî zmanên din diaxifin ra daynin û van pêwendîyan biparêzin.
- bi vî awayî, ku ew dihêlin, ku zarok behsa tiştên, ku wî di dersa HSK da û di dibistanê da hîndibe bike.
- bi vî awayî, ku ew pêwendîya bi mamostên HSK û dibistana fermî ra biparêzin.

Sazûman (Organizasyon)

Dersên HSK ji alîyê balyozxanên welatan ve an jî sazîyên teybet ve tê dayîn. Ders li gor grupên zman ji bexçê zarokan şunva, di sinifên 1'emîn an jî 2'yemîna dibistana pêşîn da tê dayîn. Serîlêdan bi rîya dibistanên fermî ve tê kirin.(Xeynî kanton Bernê).

Dersên zmanê welat li gor qaidan li dibistanê fermî û li gor îmkanan li nêzîkî mala zarok tê dayîn.
Dersên HSK li gor usûlên demên dibistanên fermî tê amadekirin (Tehtîl, Qarne).
Nirxandina rewşa xebatê di qarnê an jî di agahîyên hînbûnê ya dibistanê da cî digire.

Adressên pêwendîyê yên kantonê

Volksschulamt des Kantons Solothurn
St. Urbangasse 73
4509 Solothurn
Sachbearbeiter HSK, Marc Gugelmann
marc.gugelmann@dbk.so.ch
032 627 63 22

Solothurn, 24. Januar 2011

Erarbeitet von den Erziehungsdepartementen und Bildungsdirektionen der Kantone Basel-Stadt, Basel-Landschaft, Aargau, Bern, Solothurn und Fribourg, in Zusammenarbeit mit den Trägerschaften des Unterrichts in heimatlicher Sprache und Kultur.